OM Å VÆRE FORELDRE I BARNEHAGEN
**KURDISK – KURMANJI**

# DERBARÊ DÊÛBAVBÛNÊ
## li zarokxanê



# HEVKARIYA DI NAVBERA ZAROKXANÊ Û MALÊ DE

Ji bo ku zarok kêfxweş û mezin bibin, hebûna hevkariyeke nêzîk di navbera malê û zarokxanê de girîng e. Di qanûna zarokxaneyan û rêziknameya li ser planê çarşoveyî ji bo naverok û erkên zarokxanê de giringiyeke mezin bi wê yekê tê dan. Ji bo ku hevkariyeke baş bi serfirazî pêk were, divêt têkiliya dêûbavan û zarokxanê ji nêz ve hebe. Ew têkilî rojane bi rêya birin û anîna zarokî û bi rêya danûstandinên pêşdeçûnê û civînên dêûbavan pêk tên.

## Destpêkirin

ber wê yekê xweş bike ku her ji roja yekem zarok û dêûbav hest bi ewlehiyê û bixwebaweriyê bikin. Zarok ji hev cûda ne, û li hember destpêkirina li zarokxanê bertekên cuda nîşan didin. Hinek zû bi derûdora xwe ya nû re ewledar dibin, lê di heman demê de hinekên din ji bo wê yekê bêtir hewceyî wextî ne.

Li destpêkê divêt zarok bi tenê çend saetên kêm li zarokxanê bi yek yan herdu dêûbavên xwe re be. Hejmara saetan dikare hêdî hêdî bê zêdekirin. Zarokxane wê li ser ka divêt rojên pêşîn çawa bên rêxistin bi we re li hev bê. Di wê heyamê de hazirbûn û hebûna we ji bo zarokî girîng e. Herdem dema hûn diçin me agahdar bikin. Ji zarok re bibêjin ku dema hûn diçin karmendên zarokxanê wê çavê xwe li wan bikin. Ev yek alîkariyê dike ku zarok xwe ewle hîs bike, û baweriyê bi we jî û karmendan jî bîne.

Pir zarokxane dixwazin dirust piştî zarokî/-ê dest bi zarokxanê kir danûstandinekê bi dêûbavan re bikin. Ew danûstandin wê alîkar be ku zarokxane zarokî/-ê baştir nas bike. Li vir hûn dikarin behsa hewcedariyên taybetî yê ku zarokî/-ê hene, bikin. Ew hewcedarî dikarin têkildar bin bi xwarinê, xewê û berjewendiyan, û ka kî ye yê ku wê zarokî/-ê bîne, an tiştekê din yê ku zarokxane wê li berçav bigire. Herwisa di wê danûstandinê de wê fersend ji zarokxanê re çêbibe agahdariyên girîng ji we re bide.


© Marte Rosenvinge










## Agahdarî li ser naveroka zarokxanê

Hemû zarokxaneyan planeke salane yê ku saloxa pêşkêşiyên perwerdehî yên zarokxanê didin, heye. Weke din zarokxane pir caran agahdariyan bi rêka nameya mehane û nameya beşê zarokxanê dide. Li vira hûn ê planan ji bo ka wê çi çêbibe, û belkî hilsengandineke çalakiyên ku hatine encamdan werbigirin. Pir zarokxane bi rêkûpêkî bi rêya wêneyan, nivîsan an jî bi herdu rêyan ka di nava rojê de çi çêbûye belgedar dike. Herwisa beşeke zarokxaneyan ji bo bihevregohurîna agahiyan çareseriyên dîjîtal bi kar tînin.

## Danûstandinên nefermî

Pir ji têkiliya ku di navbera zarokxanê û dêûbavan de bo mînak li dolaba kican di dema anîn û birinê de bi danûstandinên nefermî çêdibe. Wê çaxê pir zarok û mezinên din jî li wê derê ne. Heke hûn bixwazin li ser tiştekê ku kesên din pê nebihîze baxivin, hûn dikarin ji bo wê yekê daxwaza cîvîneke taybetî bikin.




## Danûstandinên fermî

Zarokxane wê ji bo danûstandinên pêşveçûnê yên ji mecbûrî du cara di salê de we bivexwîne. Ev danûstandin di navbera mamostayên zarokxanê û dêûbavên her zarokekî de ye. Di danûstandinê de hûn dikarin bi hev re derbarê ka hûn hewcedarî, halxweşî û pêşveçûnên zarokî/-ê çawa dibînin. Heke hûn bixwazin hûn dikarin daxwazê bikin ku zarokxane ji bo danûstandina pêşveçûnê wergêrekî peyda bike.

## Civînên dêûbavan

Zarokxane carekê an du caran di sale de civînên dêûbavan ên hevbeş li dar dixe, li wir hemû dêûbav têne vexwendin(gazîkirin). Di civîna dêûbavan de, pirsên heyî yên ku li ser zarokxanê ne têne nîqaşkirin, û hemî dikarin gotinên xwe bikin.

## Desteya dêûbavan û komîteya hevkariyê

Desteya dêûbavan ji dêûbavên hemû zarokên ku li zarokxanê ne, pêk tê. Desteya dêûbavan wê berjewendîyên hevpar yên dêûbavan bêxe pêşçav, û bibe alîkar ku hevkariya di navbera zarokxanê û koma dêûbavan de jîngeheke baş a zarokxanê biafirîne.

Komîteya Hevkariyê (KH) ji dêûbavan û karmendên li zarokxanê pêk tê. KH wê hevkariyeke baş di navbera zarokxanê û mala zarokî/-ê de piştrast bike. Mijarên girîng ji bo zarokxanê wê ji aliyê KH bên çareserkirin. Mînak li ser mijarên weha, plane salane, bûdce, guhrîna rengê xebatê an rêxistinê ye.

---

BERGEN
KOMMUNE

Skipnes.no Svanemerket trykksak, 2041 0731 Foto forside: © Asle Bentzen